# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (153):
## Gundên "Bi rcikê û Qîlê" yên binpêkirî, berdana hin girtiyên zorane veşartî, bêserûberî û serberdayetî, binpêkirinên virdewêve













Ne seyr e ku Hikometa (Dad û Geşpêdanê - Eledalê we Eltenmiyê) - Turkiyê bi hezaran ji endamên milîseyên Sûriyê yên pêve girêdayî bişîne "Afxanistanê" û bi stubariyên leşkerî hilpesêre, ji ber ku dîrokeke wan ji nandoziyê li ba Anqerê li dijî hemwelatiyên welatê wan heye û li Lîbiya û Ezerbeycanê, û herweha çetayetî û tewankarî ji xwe re kirine kar bê ku enî û binkerkê yekî ji wan xu bide.

Vaye rewangeriyeke nû ji binpêkirin û tewanên ku li Efrînê bûne re:

**= G."Bircikê":**

Bi Navça Cindirêsê ve girêdayî ye, li Bakur - Rohilatê navenda wê dikeve û /7/KM jê dûr e; Ji /28 mal = 15o nişte/ pêk tê, jê: /8 malbat = 50 nişte/ ji pêkahateya Ereb in ( ên ku ji dema cîbicîkirina Zagona Çakirina Çandiniyê - Qanûn Elîslah Elzîra'î ya navêna dawiya salên pêncî û destpêka şêstî ji sedsala borî ve li gund hatine bicîkirin), dora /40/niştecî di navêna dehsalên şerê Sûriyê de ji gund derketin, dora /70/nişte jî ji ber dagîrkeriyê neçar bûn koçber bibin, tenê jê dora /13 malbat = 40 nişte/ li gund man, û dora /20malbat = 120 nişte/ ji anîndeyan di malên ên ne li gund de hatin niştecîkirin.

Di dema êrîşkeriya bi ser herêmê de, du kes ji gund "Behcet Ebdo kurê Niyazî/19/sal di berevaniya di ber herêmê de û Hisnî Behcet/67/sal bi qurşîna sekvanekî ji milîseyan li pêş guvêşgeha wî ya zêtûna ya li ser riya Cindirêsê - Efrîn" şehîd bûn, û mala hemwelatî "Behcet Hisên" jî bi piçekî hate roxandin.

Piştî dagîrkirina gund, milîseyên "Elşerqiyê" hemî heyînên malan ji xwarinvexwarinê ve bigir ta firaxên baqirî, alav û amûrên elektirîkê, raxistek, amûr û tabloyên enerciya royê, cîpekê yê hemwelatî "Mihemed Menan Axa", /2/turektor ên herdu bira "Mihemed û Ezet kurên Menan Axa", /4/matorên elektirîkê yên "Mihemed Menan Axa, Behcet Xelîl Behcet, Mihemed Sîdo, Betal Behcet", /6/mator dutekerî yên "Menan Mihemed Behcet, Betal Behcet, Hemodê Hisnî, Behcet Hisên, Nûrî Îbik, Ebdo Elî Beg", tilêre û sîtêrê avê û kîlfetor ên hemwelatî "Ebdo Elî Beg", û weha jî tevahiya heyînên mala hemwelatiyê Ereb "Hesen Remedan" tevî derî û penceran dizîn, bi ser de jî dizîna hemî kebil (kêbil) û hin stûnên toreyên elektirîk û telîfona zemînî yên giştî û tiransê elektirîka gund.

Milîseyên "Elşerqiyê" ya ku vêla hemwelatiyê zorane koçberbûyî "Fewzî Sîdo kurê Ebdo" ji xwe re kiriye biryargeheke leşkerî, dest danî ser dora /5500/darên zêtûnê, jê: /800/dar ên kurên "Ebdo Sîdo", /1000/dar ên malbata"Îbkê", /800/dar ên "Ebdo Elî Beg", /500/ dar ên "Hisênê Şivan", /400/dar ên "Betal Behcet" û /2000/dar jî ên"milkên dewletê - emlak eldewlê", weha jî dest danî ser lîstgeha gokê ya "Hesen Remedan - ji pêkhateya Ereb" a li ser riya B.Cindirêsê - Efrîn, bi ser de jî guvêşgeha zeytûna ya şehîd "Hisnî Behcet" û paşê piştî du salan kurên wî vêrgiyeke diravî mezin dan ta ku vegerandin, lê him di karanîna wê guvêşgehê û him jî guvêşgeha "Mihemed Behcet - a li ser riya Cindirêsê û Efrînê" de bû ortaq, herweha ew ta niha nîvî berhemên werzên zeytûna yên kesên ne li gund (ên ku merivên wan ji ber ve hiltînin) bi zorê ji xwe re dibin, weha jî "Komela Şamê ya Xêrxwaziyê - Turkiyê - Cem'iyit Şam Elxeyriyê" li Avdara 2021an avakirina Mizgefta "Dar Elxelîl" li ser erdê goristana gund hate -di çarçewa tevgereke olî ye hişkbawer û çalak de- bi dawî kir. Û herweha Milîseyên ku gund desteser dikin hin darên merxê yên kevnar ên di hewşên malan de ji bo êzingkirinê qut kirin.

Piraniya xelkê gund rastî rengereng binpêkirinan (girtin û işkencekirin) hatin, jê: "Berkat Reşo/60/sal" hate girtin û kotekirin û dora/15/rojan hate hepiskirin, "Xedîce dora /50/salî - hevjîna Berkêt" dora heftakê hate hepiskirin, hemwelatî "Hemîd Mûse" û kurê wî "Mûse Hemîd" - ji pêkahateya Ereb dora heftakê hatin hepiskirin û işkencekirin, û "Niyazî Elî Beg/65/sal" û "Hesen Çe'inik/65/sal" demin hindik hatin girtin û işkencekirin.

**= G."Qîlê":**

Li Rohilatê B.Cindirêsê dikeve û /5/KM jê dûr e, ji dora /20 mal = 100 nişte/ ji nişteciyên Kurd ên resen pêk tê, jê dora /5/ malbatan ji ber êrişkerî û dagîrkeriyê zorane hatin koçberkirin, dora /60 nişte/ lê man, û dora /6/malbatalan ji anîndeyan di malên ên koçberên gund de hatin niştecîkirin.

Di dema êrişkeriya hatiye ser herêmê de, "Mîdiya - keça Ibrahîm Xelîl Şarê" ji xelkê gund di berevaniyê de şehîd ket, û /5/ şervanên keç jî di bombebarana gund de, bi ser de vêla "Ferîd Gule Xêrî- li Rojavayê gund" bi giştî û mala "Ebo" bi piçekî hatin roxandin .

Di kurtedema talankirina milîseyên "Elşerqiyê" ji gund re piraniya heyînên hin malan dizîn.

Di dû re dora /1000/ darên merxê yên temenmezin ên daristanoka Rojavayê gund (malê dewletê) ji kokê ve ji bo êzingkirinê qut kirin.

Di navboriya dagîrkeriyê de hin ji xelkê gund hatin girtin, gefkirin û işkencekirin, ji wan: Herdu hemwelatiyên bira "Ehmed û Mihemed kurên Ferîd Gule Xêrî" û "Es'ed Se'îd /57/sal" (ê ku di dema girtinê de bi şev êriş malê kirine, gef li hevjîna wî bi revandina kurê wê kirine, û jinik neçar bûye ku çi pere û zêrmêrên wan ên di mal de bide wan).

**= Berdana hin girtiyên zorane veşartî:**

Careke din û weke tekezî ji hebûna hepsên bi dizî û girtiyên ji sê sal û nîvan ve zorane veşartî re, li 1.7.2021an, destlatên dagîrkeriyê hemwelatî "Silêman Hec Ibrahîm kurê Mihemed/35/sal" ji xelkê Bajaroka Şiyê (yê ku li 28.3.2018an li Bajaroka Be'idîna di dema rûniştina wî ya demkî li ba malbata hevjîna xwe re hatibû girtin) berdan, û berî berdanê bi du mehan ji Hepsa "Çoban Begê - Elra'î" bo Hepsa "Maratê" - Efrîn hate guhestin û sezayeke diravî li ser hate ferzkirin, yanê ta ku hate berdan xwediyên wî dora du hezar dolar zirar kirin, herweha jî hemwelatî "Mistefa Xelîl kurê Mihdîn/40/sal" ji xelkê heman bajarokê (yê ku li bajarê Efrînê rûniştî, li Havîna 2018an hatiye girtin, bêtirî du sal û nîvan di Hepsa "Çoban Begê - Elra'î"de bi zorê veşartî maye, û rastî işkenceyeke mekin hatiye û ji ber wê lingekî xwe û hin kanînên govdeyî wenda kiriyê) berî sê heyvan berdan, lê xwediyên wî ji tirsa ku careke din were girtin ranegîhandin.

**= Bêserûberî û serberdayetî:**

-Li kat sisê Pêncşemê piştî Nîvro 1.7.2021an, çar çekdarên serûgirtî li orta Geliyê "Tîra" - N.Reco, otombîleke "Encûmena Xwecihî ya Reco" û çar karmend têde sekinandin, pere û amûrên telîfûnê "xilyewî" ji wan birin û berdan, û tenê "Hesen Mihemed Xelîl" ji xelkê Gundê "Berbenê" li cem xwe hîştin, dabanca wî jê standin, dest girêdan, çav girtin, lêxistin, di riyeke axî re bi aliyê Gundê "Cêqilemê" ve birin, û paşê avêtin kêlek rêkê, bi ser hevakariya wî ji rojên pêşî ve bi destlatên dagîrkeriyê re ( çimkî ew endamê xwecehiyê û berpirsiyarê keyayên navçê bû). Divê were zanîn jî ku cîgeha bûyerê di bin desteseriya "Firqit Elhemzat" de ye.

-Li Siba Yekşemê 4.7.2021an, li dema ku temenmezin "Şe'iban Mihemed Reşkûr" ji xelkê Gundê "Xelîlaka" - N.Bilbilê li nav zeviyê zeytûnên xwe ya nêzîk Gundê "Bîbeka" - N Bilbilê û li rex riya giştî, hin

çekdaran destên wî girêdan, çav girtin, xilyewî û matora wî ya dutekerî jê standin, û paşê weha hîştin, ta ku hin rêwiyan ew vekirin. Û divê bê zanîn ku Milîseyên "Lîwa'i Elmu'itesêm - Firqit Elsultan Mûrad" desteseriya herdu gundan dike.

-Li gor jêdereke ragîhandinî ye xwecihî, li 9.7.2021an, kesekî ji anîndeyên Heleb, li mala xwe ya di kolana vêlat de û li orta Bajarê Efrînê, hevjîna xwe bi bêrê kuşt, paşê jî lingên xwe bi benzînê şewitandin.

-Li Şeva Înê/ Şemiyê 10.7.2021an, giropeke çekdar serûgirtî bi otombîleke teksî ye vê nimre, hemwelatî "Ehmed Bekir kurê Elî - endamê Encûmena Xwecihî ya Bilbilê" ji mala wî ya li Gundê "Hazira - Qestelê Xidriya" - N.Bilbilê revand, bire derveyî gund, û piştî mekin lêxist û bi qundaqên çekan li serî da, ew çekir korteke bi kûraniya /2/M an; Û weha ma ta ku li Sibeha wê rojê bi xwe kanî bihesiya, ji kortê derketa û vegeriya, û li dermankiringehê bihata dermankirin. Û berê jî ew bêtirî carekê tûşî lêdan û kêmrûmetkirinê hatiye.

**= Binpêkirinên din:**

-Bi behaneya belavkirina goşt di Cejna Qurbanê ya bê de, Rêxistina "AFAD - Serokatiya Rêvebirina Xişim û Awerteyên Turkiyê" ya ku bi Istîxbaratên Turkiyê ve girêdayî, tevaya daxuyanên endamên malbatên ku wê paran bistînin (wêneyên kertên wan ên kesayetî, ka ew ji nişteciyên resen an ji anîndeyan in, û ji kîjan herêmê ne) dide komkirin û sazkirin; Û weke zanyarî ew bi şêwakî fere li Navçên "Şera û Bilbilê" tevdigere û çalak dibe.

-Li Şeva Carşem/ Pêncşemê 8.7.2021an, giropeke çekdar tibabeke "simaqê" ye amedekirî derdora/600/KG × /5000/PS buhaya her kîlokê= /3/milyon PS, ji mala hemwelatî "Ebid Elrehman Dawod" li orta Gundê "Zerka" - N.Reco (yê ku Milîseyên "Feyleq Elmecid" desteser dike û serkêşê wê li gund jî bi "Ebû Welîd" tê nasîn) dizî.

- "Berevaniya Sivîl li Efrînê - Eldîfa'i Elwetenî" tekez kir ku tîmên wê agirek ( e ku bi daristanên ihracê li N.Cindirêsê hatibû xistin û derbasî nav hin darên zeytûna bûbû, û dora du hezar dar bi rûberiya /20/hiktar erd şewitandibû) li 6.7.2021an vemirandin, û li 7.7.2021an agireke bi rûberiya /8/hiktar daristanên ihracê li N.Reco vemirandin, û herweha jî li Şeva 6.7.2021an agirek bi daristanên bilindahiya "Kelûşkê - hafa Gola Meydankê" hate xistin; Û ji ber piragirên ku bi daristan û zeviyên çandiniyê dikevin û ferebûna rûberên cîgehên têne şewtandin û li rex wê jî qutkirina berdewam ji destpêka dagîrkeriyê ve ji herêmê re bi şêwakî nebûyî, ew weke qirkirinekê ji jîngehiyê re û tewaneke mebestkirî li dijî mirovahiyê tête jimartin .

-Milîseyên "Firqit Elsultan Silêman Şah" ya ku "Mihemed Elcasêm - Ebû Emşe" serkêşiya wê dike, li 7.7.2021an perwerdeyeke leşkerî ji endamên xwe re, di bin Ala Turkiyê de û bi navê "Perwerdeya Gurên Bakur" - yanê mîna navê "Gurên Beresorî - Elzî'ab Elremadiyê" ya Turkî ya tundrew- li ser erdeke çandiniyê ye malbata "Gulîn Elûş - ji xelkê B.Şiyê" û li nav zeviyên zeytûnan ên li deştê, li dar xist û bi dawî kir, û di encamê de ziyanin pir gihîştin malmewdanên xelkê.

Her yekî Sûrî kiryarên Milîseyên Sûriyê yên dijayetî û li dijî Kurdên Sûriyê têne kirin -bi taybetî jî li Herêma Efrînê- şermezar neke, nikane ji Hikometa Anqerê bipirse ka çima ew bi hezaran ji endamên wê dibe şerên xwe yên derve!

11.07.2021an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**
**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

- G."Bircikê" - N.Cindirêsê, û vêla hemwelatî "Fewzî Sîdo" - biryargeha leşkerî ya Milîseyên "Elşerqiyê".
- Şewatek li daristanên ihracê li N.Reco.
- Şewatek li daristanên ihracê li N.Cindirêsê.
- Erdê Malbata "Gulîn Elûş" - B.Şiyê, cîgeha perwerdeyeke leşkerî ji Milîseyên "Firqit Elsultan Silêman Şah" re.